## Rojên Filmên ji Kurdistan û Rojhilata Navîn ên Orient Expressê

# Stratejiya li dijî teslîmiyetê: Hêvî

❍ Orient Express cara 4'an li Swîsreyê rojên filman û hefteyên çandê organîze dike. Orient Expressê dirûşmeya xwe ya îsal weke "Hêvî" (bi Elmanî Hoffnung) diyar kiriye û li ser afîşa xwe jî şaxekî hejîrê derxist pêş lewma şaxê hejîrê weke sembola hêviyê tê zanîn.

Orient Express hewl dide her sal li Swîsreyê û kantonên wê filmên Kurdî û her wiha yên ji Rojhilata Navîn derxe pêş û bide temaşekirin. Orient Express bi vî awayî dixwaze pireke çandî ava bike di navbera welatan de û ji ber vê yekê çalakiyên çandî teşwîq dike.

Orient Express tenê filman nîşan nade, di nava hefteyên çandê de konser, panel û kargeh jî tên lidarxistin. Her wiha ji bo îsal bi derhênerên beşdarî rojên filman bûyî re dê kargehên senaryo û filman jî werin organîzekirin û piştî kargeh bi dawî bûn, di sala 2024'an de filmek jî wê were çêkirin. Dîsa di nava sala 2024'an de kargehên kamera û vîdeoyan jî dê werin lidarxistin.

Orient Expressê îsal xwe tehe-band û ji bo nîşan bide bi tevahî 18 film neqandin û dê ev film dê li 4 kantonan werin nîşandan. Her wiha, derhênerên filman jî dê beşdarî nîşandana filman bibin û bi derhêneran re hevpeyvîn jî wê pêk werin. Îsal derhêner Zekî Demirkubuz, Ozcan Alper, Ali Ahmadzadah, Shahrbano Sadat, Ayşe Polat, Kasım Ordek û Somnur Varda dê beşdarî nîşandana filman bibin û bi temaşevanan re werin gel hev.

Slogana rojên filman a îsal jî "Hoffnung" e, yanî bi Elmanî "Hêvî" ye. Li ser afîşa rojên Filman a xwe jî Orient Expressê şaxekî hejîrê derxist pêş lewma şaxê hejîrê weke sembola hêviyê tê zanîn.

**Hêvî weke stratejiyekê**

Orient Express filmên nîşan dide jî weke hêviyekê dinirxîne û dibêje, niha li dinyayê tişta herî zêde pêdiviya insanan pê heye, hêvî ye. Rêveberê Orient Expressê, Aydin Sevînç got; "Hêvî, li hemberî reşbînî û teslîmiyetê stratejiyek e." û wiha dewam kir; "Ez filman weke paceyeke ku ber bi dinyayê ve vedibe, dibînim û dinirxînim. Nexasim jî şer û qewimînên li dinyayê her roj hinekî din me diêşînin û ditirsînin. Di van rojên ne xweş û giran de film dikarin nihêrînên cuda bi ber me bixin û em jî dikarin bi rêya filman li jiyanên cuda binihêrin. Ji lewma jî her filmek weke psûlayekê ye. Hêvî jî dibe hêza hebûnê û dikare weke stratejiyekê mirovan li ser lingan bihêle."

**Di bernameyê de 4 filmên Kurdî hene**

Filmên Kurdî yên ku îsal di bernameya Orient Express de cih digirin jî ev in; Im Toten Winkel (Li wê quncika xuya nake) -Ayşe Polat, Wergerandina Ulysses-Firat Yucel-Aylin Kuryel, Wêneyek ji bo aramî-Saroyan Ismaîl, Şiwênpence-Zanyar Mihemmedînkû, The inhabitants of the lostland (Xelkê welatê wenda)-Gulan Kılıçoğlu Yuzbaşî

Orient Express di nava Cotmeh, Mijdar û Kanûnê de dê filman nîşan bide. Kantonên ku film li wan dê werin nîşandan jê ev in: Bern, Zurich, Basel û St. Gallen. Nîşandana filman ya Bernê 24'ê Cotmehê dest pê dike û ew ê heya 30'ê Cotmehê bidome.

Dem û cihên nîşandana filman û çalakiyên "Hoffnung"ê li kantonên cihê weke li jêr e:


Im Toten Winkel


Wêneyek ji bo aramî


Şiwênpence


Wergerandina Ulysses




**Bernameya nîşandana filman**

**Bern:**

24 -30'ê Cotmehê-Sînemaya ***Quinnie***

**Zurich:**

1-5'ê Mijdarê-Sînemaya ***Uto Kino*** û ***Rote Fabrik***

**Basel:**

8-19'ê Mijdarê-Sînemaya ***Neueskino***

**St. Gallen:**

9 – 27 Mijdarê-Sînemaya ***Kinok***

**Konser**

***2'ê Mijdarê***

Îlhan Erşahin Konsera Stenbol Session - Kaserne li ***Basel***

***4'ê Mijdarê***

Îlhan Erşahin Konsera Stenbol Session - Rote Fabrik li ***Zurich***

***1'ê Kanûnê***

Aynur Dogan - Stadtcasino li ***Basel***

Ji bo temamê bernameya Orient Express a li kantonan lînk û koda bi çarçik (QR-code) li jêr in:

https://www.oeff.org/

**NAVENDA NÛÇEYAN**

---

# Li Varşovayê jin jiyan azadî

Di 12'ê meha Cotmehê de li muzexaneya Varşova ya paytexta Polonyayê pêşangehek taybet ji bo jinan û karê jinên Kurd bi navê 'Jin Jiyan Azadî' hate vekirin. Tabloyên jinan bi çavên wênegirên jinên Kurd hatin nîşandan. Pêşangeh ew ê heya 28'ê Çileya 2024'an vekirî be.

Ev pêşangeh ji sala 2021'an ve ji aliyê Muzexaneyê ve amadekarî jêre tê kirin, armanc nîşandana kedek cuda ya jinên Kurd e ku ew karesat û nexweşiyên ku jinan li jinan qewimîne bidin nîşandan.

Di pêşangehê de wêneyên rojnameger Tewar Adil û wênegira ji Başûrê Kurdistanê Sara Namû hatin nîşandan. Tewar Adil bi navê "Werzê Jin" di televizyona JIN TV de bernameyekê çêdike û wêneyên wê yên ku di pêşangehê de hatine nîşandan ew wêne ne ku di bernameyê de jî hatine nîşandan. Tewar Adil lig undan geriyaya û wêneyên gundan girtiye.

Tewar Adil got: "Armanca arşîvkirina van wêneyan derxistina ked û hêza jinên gundan e. Min xwest keda jinên Kurd bi rêya wêneyên xwe nîşanî cîhanê bidim."

Projeyeke xwedî çarçove û dirêj e

Çalakvana ziman û çanda Kurdî ya ji Bakûrê Kurdistanê Bêrîvan Matyar bi wêneyê jinan beşdarî pêşangehê bûye û derbarê armanca pêşangehê de got: "Jinên çar parçeyê Kurdistan û dîaspora beşdarî pêşangehê bûne da ku ked û hêza jinên Kurd bibînin. Pêşangeh di çarçoveya projeyek dem dirêj de hatiye amadekirin."



Bêrîvan Metyar çend salan li Bakûrê Kurdistanê xebatên parastina ziman û çanda Kurdî û arşîvkirinê dike. Ew kombûnên jin saz dikin û kar hunerek cuda tê de hebe Bêrîvan Matyar wêneyên wan dikêşe û yek ji wan wêneyên ku Bêrîvan Matyar di pêşangehê de beşdar bûye wêneyê komek jinên dengbêj e ku li gel wan kar kiriye.

Ziman û çanda me jî cîhanî ye

Bêrîvan Metyar wiha behsa beşdarên pêşangehê kir: "Ew kesên ku serdana pêşangehê dike me piştgiriya wan kir, di pêşangehê de pirsên cuda dikirin. Rengînî cûdahî û çalakiyên jinên Kurd dibînin û ji bo hemûyan gelek balkêş bû. Em jî kesên cîhanê ne, ziman û çanda me bi cîhanê ve girêdayî ye. Ji ber wê parastin û hebûna vî ziman û çandê dibe erkê cîhanê jî û ev dewlemendiya çand û ziman, dewlemendiya cîhanî ye. Ji ber wê pêşangehên bi vî awayî rastiya van mijaran nîşan dide, rol û bandora ziman û çanda cîhanê radixwe berçavan."

Jin jiyan azadî êdî paradîgmayek e

Bêrîvan Matyar wiha behsa pêngava 'Jin Jiyan Azadî' ku bandor li ser hemû jinên Kurd û jinên cîhanê kiriye kir û got: "Piştî qetilkirina Jina Emînî dirûşmeya 'Jin Jiyan Azadî' ji aliyê cîhanê ve hate berzkirin û ev dirûşeme ji bo jinana êdî weke paradîgmayekê hate qebûlkirin. Dema ku hemû jinên cîhanê hatin ba hev û xwe bi rêxistin kirin, em ê zêdetir bikarin deng û armanca 'Jin Jiyan Azadî' bigihînin cîhanê."

**NÛJÎNHA/VARŞOVA**



# Pêşangehek navneteweyî ye

Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol cara 7'an bi beşdariya hejmareke mezin a weşanxaneyên ji hundir û derveyî herêmê dest pê dike. Pêşangeh dê 28'ê Cotmehê li hola Zana ya li bajarê Qamişlo bê vekirin.

Pêşnageha Yekemîn a Pirtûkan a Şehîd Herekol di sala 2017'an de hemwextî salvegera şehadeta têkoşer Herekol (Hisên Çawîş) li dar ket. Pêşangeha îsal bi dirûşma "Xwendin ronahî ye" li dar dikeve.

Endamê Komîteya Amadekar a pêşangehê Ebdulmecîd Xelef got, "Amadekarî gihîştina qonaxên dawîn."

Pêşangeh dê 4 rojan bidome. Pêşangeh dê ji saet 10:00'an heta 20:00'an vekirî be û dê çalakiyên çandî, hunerî û pêşbirk jî werin lidarxistin.

Têkildarî pirtûkên ku dê werin pêşandan, Xelef got: "Di pêşangehê de dê bi deh hezaran pirtûkên bi mijarên cûrbecûr ên siyasî, çandî, dîrokî, civakî, leşkerî, olî, felsefeyî û roman werin pêşandan. Her wiha pirtûkên ku nû hatine çapkirin û pirtûkên ku ji zimanên cîhanî hatine wergerandin jî dê hebin. Êdî pêşangeh bûye pêşangeheke navneteweyî û ketiye nav bernameya salane ya weşanxaneyên cîhanî".

**60 weşanxane beşdar dibin**

Di pêşangeha îsal de dê 60 weşanxane û saziyên çandî beşdar bibin, ji wan 24 xwecih ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û 37 ji herêmên din ên Sûriyeyê û Lubnan, Urdin, Misir, Îmarat, Başûrê Kurdistanê, Tirkiye, Bakurê Kurdistanê û Îtalyayê ne. Par tenê 51 weşanxane beşdarî pêşangehê bûn.

Ebdulmecîd Xelef got: "Hejmara sernavê 14 hezar û 200 û hejmara pirtûkan 141 hezar pirtûk dê bi zimanên Kurdî (Kurmancî, Soranî û Zazakî), Erebî, Farsî, Tirkî, Îngilîzî û Fransî berdest bin."

Rêjeya berhemên jinan di pêşangehê de ji sedî 40 e, her wiha beşek taybet a zarokan û pirtûkên zarokan heye, tê de kovara Mizgîn û pirtûkxaneya Rona yên xwecih cih girin.

Pêşangeh dê diyarî ji bo ruhê rojnamevan û nivîskarê Kurd Mûsa Enter be. **ANHA / QAMIŞLO**

# Bernameya Şaneşîn Performansê




Şaneşîn Performans ku weke sahneyeke alternatîf li Mêrdînê hatibû damezirandin, bernameya xwe ya meha Mijdarê eşkere kir.

Şaneşîn Performans piştî ku sahneyekê ji xwe re ava kir di meha Mijdarê de bernameyeke bi rêk û pêk ya mehane parve kir.

Di bernameya Şaneşîn Performansê de lîstika bi navê Şengê û Pengê jî heye ku ji bo zarokan hatiye hazirkirin.

Her wiha lîstikên din jî ev in ku ew ê di meha Mijdarê de li Şaneşîn Performansê derkevin ser dikê;

Cîhana Tenêtiyê-Şanoya Kanî Bokan

Mirina Jeanne D'Arcê Ya Din-Şanoya Bajêr a Amedê

Şêxê Sen'Anî- Şaneşîn Performans

Înfaz-Şaneşîn Performnas

**MÊRDÎN**